

Bidestveanîna mafên neteweyî
yên gelê Kurd di çarçoveya
Îranek Demokratîk û Federalî de

Hejmar: 45

15'ê Augustê

Buha: 150 Tûmen



Cejna 25'ê Gelawêjê Pîroz Be

Îsal jî em ber bi cejna 61'emîn salroja avabûna PDK Îranê, partiyek ku hemû dîroka pir ji şanazî a xwe di pêxema xebat û tekoşîn ji bo gihîştin bi armancên mirovî û aştiwazane yên xwe û gelê xwe daniye û herwiha di vê rêyê de gavan hildigire.

Em jî cejna 25'ê Gelawêja Îsal (2006)'an, ji hemû neteweya Kurd, bi taybet malbatên şehîdan û girtiyan siyasî pîroz dikin û hêvî xwazin ku di pêşerojê nêzik de em vê cejnê di Kurdistanê azad de bigirin.

Malbata weşana Agirî

Rojnameya panzdehrojî ya siyasî, çandî û giştî

Partiya Demokrat ya Kurdistanê Îranê diweşîne

Birêz Mistefa Hicrî di Konferanseke
Çapemeniyê de:
**JÎ ALIYÊ ME VE TU KOSP
Û ASTENGEK LÎ SER
RÊYA PÊKHATÎNA
ENÎYA KURDISTANÎ DE
NINE**



Rûpel 2

Demokrasî, biha û piratûka wê



Rûpel 4

Lênihêrînek Li Ser Pirsgirêkên Civaka Îranê



Rûpel 8

BIŞAVTIN



Rûpel 10

Hevpeyvîna **Îbrahîm
Aydınoglu** bi **Têmurê Xelîl** re



Rûpel 9

Agirê Şer Di Libnanê De Temirî

Biryara agirbestê bi nêvçitîya Rêxistina
Neteweyên Yekbûyî ji bo dawî anîn bi şerê
34 rojî yê Îsraîl û Hizbelahê, gihîşte

qonaxa piratîkê.

Roja înhê her du welatan, biryarnamêya Konseya
ewlekariyê ku xwazyarê dawî anîn bi şer û
cihgîrbûna hêzên aştiwazane yên Neteweyên yekbûyî
û hêzên Lubnanê li cihê hêzên Îsraîlê di Lubnanê de
bû, pejirandin.

Li gor nûçeyan şer heya demên nêzik bi agirbestê
ji dewam dikir û Îsraîlê da eyanê ku ger xaka Îsraîlê
bibe armanca kiryarên teroristî yên Hizbelahê,
hêzên Îsraîlê dê êrîşan berdewam bikin û bi bilaw
kirina belavokan ji xelkê Lubnanê re dan zanîn ku
Hizbelah ne girûpek Lubnanî ye, ji ber ku di xizmet
armancên welatên Îran û Sûriyayê de ye.

Dewleta Libnanê di raporekê de daye eşkere kirin
ku di encama şer de pitir ji 1000 kesan canê xwe ji
dest dane û herweha bi sedan hezar kes ji aware û



bêmal û hal bûne û ziyan û xesarên malî jî bi
2/5 milyar Dolar da zanîn. Herweha di
encama vî şerî de 152 Îsraîlî ku 113 ji wan
hêzên leşkerî ne, canê xwe ji dest dane.

Tê zanîn ku piştî agirbestê hejmareke zaf ji
aware û mişextî yên Libnanê, vegeriyan ser
mal û halên xwe.

Fîlma "Kurdistan, Welatê Nediya" Bi Beşdariya Lîstikvanên Navdar Yên Navneteweyî Tê Çêkirin

"Kurdistan, welatê nediya" navê filmekê ye ku bi
bihaya 20 milyon "Euro"yan dê bihê çê kirin û di
sala 2008'an de dê derkeve ser ekranan. Di vê
filmê de qirar e Lîstikvanên bi nav û deng weke
"Sofiya Lorn" û "Şah Kanrî" di rolên bingehîn de
bilîzin. Qasim Gultekin derhênerê Kurd yê vê filmê
diyar kir ku ew di qonaxa destpêkî ya çêkirina
filmê de ne. Wêne hilgirtina vê filmê qirar e di
herêma gola Wanê û çiyayê Agirî bihê encamdan.

Jêder: "Radio Farda"



Konferansa Netewe û Kêmaniyên Neteweyî Yên Îranê Li Almaniyayê De Birîve Çû

Roja şemî, 05.08.2006'an,
Komeleya Akademîsiyenên
Azerbaycan û Almaniyayê, bi
merema nixrandin û
şirovekirina rêyên çareserîya
pirsa neteweyên Îranê,

konferansê li ser navê **netewe û kêmaniyên neteweyî li
Îranê** de di Parlemana bajarê Berlin a Almaniyayê de lidarxistin.
Di Konferansa han de ku demjimêr 9'ê sibê heta 19'ê şevê dom kir,
kesayetî û rêxistinên ser bi neteweyên Îranê beşdar bûn:

Di beşa yekem a konferansê de nûnerên hêzên siyasî gotinên xwe
pêşkêş kirin û hîzr û helwesta partî û rêxistinên xwe ji bo
çareserkirina pirsê neteweyan şirove kirin. Ku di hemû gotarên
pêşkêşkirî de tenê du rêyên Federalîzm û serxwebûnê ketin ber
bas.

Pişka duyem a konferansê ji bo baskirina azad nemaze li ser
demokrasi, mafê neteweyî û her wiha bersiva pirsîyan hatibû
terxan kirin.

Konferans piştî 10 seetan karê berdewam bi tekez kirin li ser vê
yekê ku xwedî helwestên cuda nabe rêya doma gotûbêj û anîna
guhertinê li ser bîr û rayan de bigirin, dawî pê hat.

Nûnerê PDK Îranê di konferansa han de birêz Kekê Hacı û Dr.
Mîro Eliyar bûn.

Birêz Mistefa Hicrî, Sekreterê Giştî Yê PDK Îranê Di Konferanseke Çapemeniyê De Piştî Sefera Xwe Ya Ji Bo Derveyî Welat:

“ME WEKÎ KONGİREYA NETEWYÊN ÎRANA FEDERAL, PİROJE Û PÊŞNIYAR JÎ BO AMERÎKA Û EWROPAYÊ HEBÛN, ME PÊŞNIYARA GUHERTÎNA HİKÛMETA ÎSLAMÎ YA ÎRANÊ KIRIYE”

“JÎ ALİYÊ ME VE TU KOSP Û ASTENGEK LÎ SER RÊYA PÊKHATÎNA ENIYA KURDISTANÎ DE NINE”

Rêzdar Mistefa Hicrî, Sekreterê Giştî yê PDK Îranê, di meha Nîsana îsal bi merema encamdana hinek xebat û çalakîyên dîplomatîk, rêxistinî û wd, ji bo derveyî welat sefer kir. Di vê

seferê de, kekê Mistefa Hicrî tevî berpirsiyarên dewletî û nûnerên partiyên siyasî ên welatên Amerîka, Firansa, Bîrîtanya, Almaniya û wd... û her wiha nûner û berpirsiyarên gelek rêxistin û navendan hevdiñ hebûye.

Piştî vejeriyana kekê Mistefa Hicrî ji sefera derveyî welat, Sekretariyeta Partiya Demokratîk konferanseke çapemeniyê ji bo hêja Mistefa Hicrî pêk anî. Di vê Konferansê de ku roja pêncşem, 27.07.2006'an, hate lidarxistin, nûçegihanên televizyona “TISHK”, weşanên KURDISTAN, Ağırî, Lawan, Jinan û Radyo Dengê Kurdistanê Îranê û malpera “kurdistanmedia.com” beşdarî kiribûn.

Li vir em çend pirsên nûçegihanên û bersivên girîng ên birêz Mistefa Hicrî yên vê konferansê dixin ber çavê we xwendevanên hêja:

Sekreterê Giştî yê PDK Îranê rêzdar Mistefa Hicrî, wekî nûnerê vê partiyê û neteweya Kurd li Kurdistanê Îranê tevî partiyên neteweyên din ên Îranê yên endam di Kongreya Neteweyên Îrana Federal ji bo pêkanîna civînan di “Congress” û “Senate”a Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê de hatin vexwendin û li wir diñ û nêrînen xwe li dor zilm û zordariya li ser neteweyên Îranê anîn ziman. Derheq encam û pêvajoya wan civînan û pirsên têkildar bi van çalakîyanê hêja Mistefa Hicrî wiha pîrsa Nûçegihanê Rojnameya KURDISTAN bersivand: **“Vexwendinek ku ji me hatibû kirin ji aliyê rêxistinên Kurdî yên Amerîkayê bû, wan ew civîn bi erê û razîbûna “Congress” û “Senate”ê pêk anîbûn. Ez wekî nûnerê PDK Îranê di Kongireya Neteweyên Îrana Federal beşdar bûm û min wekî berdevkê PDK Îranê nêrîn û diñtînen PDK Îranê di vê Konferansê de ragihand û di rastî de me hemûyan weke nûnerên KNÎF pîrojekt û pêşniyarên wekî hev hebûn, ew jî eva bû ku me ji bo ragehandin û medyayên giştî ên cîhanê û li Amerîka û Ewropayê pêşniyara guhertîna hikûmeta Îslamî ya Îranê kiriye. Me pêşniyar kiriye ku Komara Îslamî bo hikûmeteke demokratîk û Federal bihê guhertin. Federalîzmek ku tê de neteweyên bindest yên Îranê bikarin hikûmeta hundirîn ya xwe hebin û di rêvebirina hikûmeta giştî di Îranê de bi awayekî wekhev beşdariyê bikin. Armanca me wekî KNÎF û her wiha wekî PDK Îranê, eva bû ku tev neteweyên Îranê bi dilxwaz û hezkirina xwe di Îranê de bimînin û bi awayekî wekhev di hikûmeta Îranê de pişikdar bin. Em li ser vê baweriyê ne ku ev cure hikûmete dikare yekparçebûna Îranê biparêze,**

berevajî ew propagandeyên ku gelek nûnerên Komara Îslamî ya Îranê yan hinek aliyên Şovînist wisa dibêjin û difikirin ku pîrsa Federalîzmê û mafê neteweyî dê bibe sedema parparbûna Îranê. Me jêve ye ku domkirina sitem, zordarî û bîedaletiyê di Îranê de dê bibe sedema cudabûnê û eleqeyê ji bo cudabûn û kerkerbûna Îranê dê bîne rojevê, lê heke neteweyên Îranê bi awayekî wekhev di birêvebirina Îranê de beşdariyê bikin, ew eleqeye dê gelek lawaz û qels bibe.”



Salek bi ser damezrandina Kongireya Neteweyên Îrana Federal wekî rêxistineke hevgirtî ku ji bo cara yekemîn di dîroka 27 saliya desthilatdariya Komara Îslamî, bi navê nûnerên neteweyên Îranê pêk hat, borî. Derheq encama kar û çalakî û xebatên vê Kongireyê di pêvajoya salek xebata wê de û her wiha çawaniya wergirtina vê kongireyê di asta navneteweyî de, Kekê Mistefa Hicrî wiha bersiva Nûçegihanê Ağırî da: **“Kongireya Neteweyên Îrana Federal pêka wê yekê ku heyameke nêzîk bi salekê ye pêk hatiye, pêşketinên baş bidestve aniye û di asta navneteweyî û opozîsyona Îranê de jî baş hatiye naskirin. Di asta navneteweyî de hinek xebatên zaf û xuya hatine kirin, bo mînak yek ji wan eva ye ku KNÎF li Amerîka wekî rêxistineke fermî hatiye tomar (tescîl) kirin û hemû ew maf û hîqûqên ku organîzasyonêkê dikare di welateke wekî Amerîkayê ji bo çalakî û tekoşînê hebe, bidestve anîne. Li Londonê biryar hatiye girtin bîroyek jê re bihê danîn, bona vê çendê ku heke seredanek tê kirin, li wir navendek hebe ku bersivder be. Her wiha di heyamê 5-6 mehên borî de şandeke KNÎF li Bîrûkselê, li Parlemantoya Ewropayê bi fermî hatine vexwendin, wan li wir axivî ye, nêrîn û ramanên xwe wekî nûnerên partî û neteweyên xwe gehandine guhê**

Yekîtiya Ewropayê. Gelek bi micidî û başî KNÎF wegirtine û bi taybetî di vê sefera dawiyê de jî ku me hebû, li “Congress” û li “Senate”a Amerîka û her wiha li Almaniya û Firansayê KNÎF li wir hizûr hebû û diñtînen xwe bi guhê rêxistin, bi guhê Ewropî û Amerîkiyan û her wisa ragihandinên giştî yên cîhanê diyar kiriye. Hinek bername hene ku di pêşerojê de hevdiñtînen din jî ji bo KNÎF li Almanyayê û her wiha li Îngilistanê jî dubare were lidarxistin. Ez bawer im eva ji bo

heyameke kurt yê yek salî ji nasandina rêxistineke siyasî gaveke gelek mezin û baş bûye, hemûyan hevgirtî nêrîn û diñtînen xwe bas kirine, gotinên xwe kirine, eva giring e ku wekî te qala wê kir, bo cara yekemîn di Îranê de organîzasyonêk ji tevahiya neteweyên Îranê pêk tê, xwestek û daxwazî û her wiha derdê dilê wan di nava kom û komeleyên navneteweyî de bas dike. Renge pir caran jî di berê de Ewropî û Amerîkayîyan gelek fikr ji neteweyên bindest ên Îranê nekiribe, lê di wê civînê de bi

serhejmarî û hejmaran hatiye nîşandan ku neteweyên bindest yên Îranê pîraniya nifûsa welat pêk tînin, lewra di pêşeroja Îranê de tu demokrasî û hikûmetek nikare berdewam û payedar be, heke bihê û neteweyên bindest ên Îranê li wir rol û mafê wekhev tune bin, eva dengeke gelek demokratîk bû ku yê gihiştîye guhê xelkê cîhanê. Xwezayî ye di nava Opozîsyona Îranê de jî KNÎF gelek baş hatiye naskirin, hinek hene ku daxwaz û xwestekên KNÎF bi rewşa berheq dizanin. Aliyên cur bi cur yên din jî hene ku diñtînen wan daxwaziyan in ku KNÎF dide xuyakirin, lê eva tu tiştêkê ji esla meseleyê ku nasandina KNÎFê ye naguherîne. Bi xweşî ve ev kongireya ku di heyamê sala derbasbûyî de pêk hatiye, ji bilî koma nûnerên rêxistinê ku di rastî da avakerên vê kongireyê bûn, di dema yek sala çûyî de, çend rêxistin û civatên din jî tevî KNÎF bûn. Niha rêxistinên din hene ku name nivîsandine û daxwaz kirine ku di KNÎF de bihên qebûlkirin ku li civîna Şanda Birêveber de ev namane dê bihên ber xwendin û lêkolînê û bersivên hêja dê ji wan re were dayîn. Heke bi kurtî bixwazim ji we re bibêjim, dikarim vê çendê bibêjim ku Kongireya Neteweyên Îrana Federal ceribandineke gelek baş û serketî bû, hem ji bo opozîsyona neteweyên bindest ên Îranê û her wiha

ji bo civaka navneteweyî bona vê çendê ku çêtir tevî neteweyên Îranê nasyariyê peyda bikin û ew zilm û zordariyên ku li ser neteweyên Îranê berdewam bûye, çi çaxê hikûmeta Paşayetiye de û çi di çaxê hikûmeta Komara Îslamî ya Îranê de."

Li gorî rapor û nûçeyên medyayên PDK Îranê, Sekreterê Giştî yê vê partiyê li Amerîka û welatên Ewropayê, bi gelek berpirsiyarên dewletî, kesayeti û saziyan re hevdîtin hebû. Derheq vê pîrsa Nûçegihanê malpera kurdistanmedia.com, ku hevdîtinên we tevî wan aliyan heya çiqas dikare li ser biryara siyasî ya van welatane, çi li Amerîka û çi li Ewropa bandor di helwestên wan de li dor pîrsgrêkan hebe, rêzdar Mistefa Hicrî wiha got: **"Me li Amerîka zêdetir tevî komeke zaf ji sazî û dezgehên hikûmetî û demokratîk ku di Amerîkayê de zaf in - Amerîka bi welatê navend û saziyên demokratîk hatiye naskirin - hevdîtin hebûye ku wan ji bilî rêxistinên hikûmetî yan dem û dezgehên hikûmî bandor û karîgeriya xwe di navendên biryardanê de hene. Me li wan cih û navendane de xwest û daxwazên gelê Kurd û PDK Îranê derheq pîrsa Kurd, bizava Kurd û ew zordariyên ku li ser de hene, herweha li ser pêşeroja Îranê bi wan kom û navendane ragihandiye. Eva ku bandora wan daxuyanî û ragehandinane heye, çi qasekê ye, siroştî ye ku divêt em çavniher bin ku di pêşerojê de bandora van bibînin. Lê bêşik hevdîtinên siyasî û şirove û derbirîna bas û meseleyan bi awayeke bi delîl û belgedar ku dikare aliyê hember qanih bike, bi xwe jî dikare bandorek erênî di navenda biryardanê de hebe. Renge tu yek ji me weke opozîsyona Îranî xwe derheq welat yan prosesê biguherin. Lê şirove û analîzên zêdetir derheq van pîrs û meseleyan ku ji bo me girîng in û wan re jî zaniyariyên nû têde hebin, dikare li pêşerojê di navendên biryardanê de tesîr hebe ku di rastî de jî erk û karên diplomasiyê ew e. Eva jî ne tenê her bi dîtina me, PDK Îranê û sazî û dezgehên hikûmetî li Ewropa û Amerîkayê, belkî di dîtîngeha dewletan de jî gava ku hevdîtînek siyasî tê pêkanîn, eva nahê wê wateyê ku di vê hevdîtinê de divêt aliyek raya aliyê din bipejirîne, ji ber ku mesele nîqaş û diyalog ji bo dîtina rêçareyan e ku bi qazanc û berjewendiyên her du aliyan de dişkê.**

Me di vê derbarê de ra û dîtînen xwe bi van navendan dayne eyanê û me raya xwe li ser wê ku Komara Îslamî çawa dikare guhertin bi ser de bihê heya ku gelên Îranê bikarin di bin stem û zordariyê de rizgar bin. Ji bo wê ku cihan û bi taybet Rojhilata Navîn li destê navenda fitne û tîkderiyê ku dewleta Îranê ye, rizgar bibe û Rojhilata Navîn bikare di prosesa demokrasiyê de pêş bikeve, çunku Komara Îslamî bi van belge û giroveyên ku me pêşkêş wan kirine û xelkê cihanê jî şarezayê wan e, navenda şer û fitne û tîkderiyê di Rojhilata Navîn de û piştevanê

terorîzmê ye, lewre divêt em çi bikin û kîjan rêçareyan li pêş xwe bigirin heya ku bikarin vê kosp û astenga mezin li ser rêya xwe hilgirin daku hemû aliyek bikarin jê mifahê bistînin. Di vê derheqê de ez dikarim bibêjim ku behs û bîr û rayên me bi dîqet hatine guhdarîkirin û di piraniya wan de soz dane ku wan behs û nîqaşane li navendên biryardanê de bînin ziman û xwendinê li ser bikin daku bigihîjin encamêkê ku ez hêvîxwazim bi qazancê hemû aliyekê dawî were."

Birêz Ebdula Muhtedî, Sekreterê Giştî yê Komeleya Şoreşger ya Zehmetkêşên Kurdistanê Îranê, di hevpeyivînekê de tevî heftenameya "Aso" li Silêmaniyê, wiha dipeyive: "PDK Îranê bû seba ku me di seredana xwe ya derveyî welat û Amerîkayê de, destkevteke wisan berçav bi dest nexist". Her wiha Ebdula Muhtedî bû ku di hevpeyivîna xwe de tevî Televîzyona Rojhelat de, hemû astengên li ser pêkhatina eniya han dixê stûyê PDK Îranê û Komelê jê paqij dike. Di derbarê van îdeyên Sekreterê Giştî yê KŞZKê de û her wiha helwest û siyasatên PDK Îranê yên herî dawî seba pêkhatina Eniya Hêzên Kurdistanî, birêz Mistefa Hicrî di bersiv pîrsa Nûçegihanê KURDISTANÊ de wiha got: **"Derheq seredana Amerîkayê hemû hevdîtinên ku qirar bû tevî Komelê û endamên din yên Kongireya Neteweyên Îrana Federal, pêk bihên, me pêk anîn. Piştî him Komelê û him PDK Îranê weke xwe hevdîtinên taybetî bi xwe hebûn. Tevî hin dezgehên hikûmetî û yên din. Ez ne bawer im û nîzanim hevdîtinên taybetî yên Komelê tevî kê û li kuderê bûne, lê derheq pîrsa hevdîtinên min, ez li ser vê baweriyê me ku ne tenê destkevten me kêm û ne berçav nebûne, belkî me karî bidestxistiyên gelek baş û berçav jî bidestve bînin. Li ser Eniya Kurdistanî jî me li mêj de gotiye û dê careke din jî bibêjin, PDK Îranê jî bo pêkanîna hevdengiyekê di navbera rêxistinên opozîsyona Îranî yên ku di nava xelkê Kurdistanê de hatine naskirin, derbasbûyîye xebatê ji gelê Kurd re hene û serbixwe ne, tu asteng û kospek çi nine ji bo civîn û baskirinê tevî yek yeke wan li ser bernamêyekê bo danîna her cure hevbendîya bi hev re, di vê derheqê de çi pîrsgrêkek ji aliyê me weke PDK Îranê ve tune ye. Berhema dawiyê ya civîn û baskirinên me jî di payîza sala borî de bû ku hemû rêxistinên han û Komeleya Şoreşger ya Zehmetkêşên Kurdistanê Îranê jî li hev kirin û qirar danîn ku li cihekê bicivin, lê dîsan her ewên ku nehatin ser qirarê xwe û xwe parastin li hatina civînan, nûnerên Komeleya Zehmetkêşan bûn ku hetanî niha jî êşkere nekirine ku ji ber çî di wê civînê de ne amade bûne. Lê belê eva ne tişteke veşartî ye, em hêzîr in bi axivîn û gotûbêjn bikin û tu astengek ji aliyê me de nine."**

Welatên Ewropa û Amerîkayê guhertin bi ser helwesta xwe li hember Îranê de anîne, her wekî em dibînin bernamêyên Etomî yên Îranê

di asta navneteweyî de gelek cihê şik û gumanê ne. Lê rexneyeke tund li ser endamên dayim yên Konseya Ewlekariya NY heye ku ew helwesteke micid û yekgirtî li ser Komara Îslamî ya Îranê de nagirin, Rêzdar Hicrî di bersiva vê pîrsa Nûçegihanê Ağırî de ku hûn sedema vê çendê di çî de dibînin ku Rûsiya û Çîn tevî dewletên din hevdeng nabin ji bo cezadana Komara Îslamî ku biryareke yekgirtî û yekdem hebe, got: **"Di pîrsyarên berê de min îşare pê kir ku armanca Komara Îslamî ji pîrojeya Etomî, bidestveanîna çekên Etomî ye û eva jî di rastî de ji bo Ewropa, Amerîka û hemû cihanê êşkere bûye ku cihê tirsê ye û lê ditirsin. Lewma jî derheq vê pîrsê ne xemsar in û ev bizava yekdest ku niha YE'ê tevî Çîn û Rûsiyayê, hemû bi hev re ji Komara Îslamî dixwazin ku dest ji pîrojeyên Etomî yên xwe berde, ji wan metirsiyane tê çareser kirin. Ez bawer im tişteke gelek aqilane ye ku hemû bi hev re xebatê bikin ji bo ku Komara Îslamî li rêya diyalog û gotûbêjê de bihê ser vê baweriyê û dest ji pîrojeya han berde, heta ku bikare ji wan îmtiyazan ku YE'ê pêşniyar kirine, behrê werbigire. Ji ber ku heya rêya diyalogê hebe, ji bo çareserkirina pîrsgrêkan, tund û tûjiyê ne aqilane ye. Bi hizra min Ewropa û Rûsiya û Çîn jî li pîrosêsa han de heta dawiyê dê tevî Amerîkayê bin. Ji ber vê çendê ku hemû ew rêyên ku hêvîdar in dê bikarin dî rêya gotûbêjê de pîrsa han çareser bikin, bicerbînin. Lê ez ne bawer im piştî ceribandina hemûyan, heke Komara Îslamî bersiva nerênî bide ku bi hizra min bersiv her NA ye, her wiha dest li ser destê hev danên û tu karekê nekin."**

Analîza Kekê Mistefa Hicrî eva ye ku Komara Îslamî bêguman dengeke nerênî dê bide bersiva civaka navneteweyî. Renge dewleta Îranê ji aliyê dewletên mezin yên cihanê û NY bikeve ber dorpeçkirin yan hisara aborî, siyasî û heta qala êrîşa leşkerî jî heye, rêzdar Hicrî helwesta PDK Îranê di bersiva vê pîrsa Nûçegihanê Ağırî de wiha anî ziman: **"Tişteke xwezayî ye ku em tevî çî cure dorpeçkirinekê de ninin ku zextê li ser gelê Îranê jî vê hindê ku heya zêdetir bike, belku her zextek hebe, divêt bikeve ser milê Komara Îslamî, di vê derheqê de ez her vê hindê dizanim ku Ewropa û Amerîka mijûlê lêkolîn û lihevdanê ne ku heke Komara Îslamî bersiva nerênî bide, ew çi bikin. Heke dorpeçkirina aborî dikin, çi bikin ku zext nekeve ser xelkê Îranê. Eva aliyê pîrsê ye û aliyê din jî êrîşa leşkerî ye ku di rastî de min hest pê nekiriye ku derkeve holê, ji ber ku êrîşa leşkerî pîrsgrêkên zaf him ji bo hêzên bîhanî ku heke êrîşê bikin, him ji xelkê Îranê re pêk tîne."**

Têdîtin: Ji ber kêmbûna cih me nekarî hemû pîrs û bersîvan di Ağırî de belav bikin li me biborin. Deqa vê Konferansa Çapemendiyê li ser malpera me hatiye weşandin û hûn dikarin bixwînin.

Demokrasi, Biha û Piratîka Wê

Encam

irsa Kurd û Demokrasi

P Me di mijara xwe de teoriyên cur bi cur yên demokrasiyê, saziyên ku nûnerayetiya demokrasiyê dikin, şirove kir, bi watayek din exlaqên

exlaqiye¹ giştî yên demokrasiyê hatin şirove kirin. Di van teoriyane da hin sazî xasmayî saziyên pêwendîdar bi dengdanê hatin bas kirin. Di beşên dawî de teoriyên pêwendîdar bi tevgeriyana mirovan di biryardanên demokratîk de bi wateyeke din exlaqên taybetî² hatin rohn kirin. Li gor wan teoriyane merca bikarbûna demokrasiyê ne tenê hebûna saziyên demokratîk, belkî tevgeriyana mirovan hatiye zanîn.

Di basa yekem ya demokrasiyê wate **wîsta gel** de, nîşana demokrasiyê di biryarên kolektîv de liberçavgirtina preferensa hemû welatiyan yan aliyê kêm piraniya welatiyan hat zanîn. Ew taybetmendîya han bi tenê nikaribe bibe nîşana demokrasiyê. Ji ber ku dîktatorek baş jî dikaribe biryarên ku welatiyan keyfxweş û memnûn bike, bide, lê mafê biryardanê jî mirovan distîne.

Teoriya wîsta gel, hin giriftên bingeîn hebûn ku li rêya teoriya hilbijartina civakî dikaribe bê şirove kirin. Teoriya "Arrow" li ser wê baweriyê ye ku dema alternatîvên hilbijartinê li duduyan zêdetir bin, wîsta piraniya gel nayê diyarî kirin. Bi baweriyê "Arrow", hemû hilbijartinên civakî dikaribin bi awayên stratejîk bî destkarîkirin. Bi hegera pêwendîya pirsgerîkan bi hev û du re, biryarên kolektîv li gor wê teoriyê tûşî aloziyê dibin. Her wisa demokrasiya li ser bingeha nûnerayetiye jî hin giriftên xwe li nûnerîkirina welatiyan de hene. Welatî nikaribin li ser hemû mijaran bi awayekî tenê tenê deng bidin. Belkî welatî di sistema han da bi bernamêyên partiyên siyasî ku pirsên berî hilbijartinê wek bername bi awayekî giştî dixin ber dengdanê.

Teoriya hilbijardeya civakî cihê pirsyarê tîne pêş, gelo demokrasiyê dikaribe wîsta gel bi cih bîne? bo minak, di teoriya demokrasiya minîmal de demokrasiyê tenê bi wateya sistemekê tê ku tê de rêberên siyasî bi awayê rikeberiya dengdanê tînin hilbijartin. Bi watayekê din her kes piraniya dengdanê bîne, ew dê bibe rêber.

Kurd û Kurdistan wek çarçoveyekî serbixwe û takîne nahê dîtin. Lewma pîrsa demokrasiyê jî bo Kurdistan girêdayî bi pîrsa demokrasiyê li van welatan ve heye ku welatê Kurdistan di navbera wan da hatiye perçe kirin û Kurdistan bûye beşek li cuxrafiya siyasî ya wan. Di vê mêzegehê de Demokrasiyê wek rikeberî jî bo bîdestveanîna piraniya dengdanê nikaribe bersîva daxwaza Kurdistan bide. Ne tenê ew demokrasiya bi vî awayî tehlûka wê yekê heye Kurdistan bi awayekî **Demokratîk** asîmîle bike û bike kêmaniyek heta hetayî. Bo minak, Îran wek mijara ceribandî ya demokrasiyê de bihê

Beşa 29 û dawî


berçav girtin. Eger demokrasiyê di Îranê de cigir bibe û sistemek demokratîk li gor teoriyên hatî baskirî, xasmayî demokrasiya minîmal yan demokrasiya lîberal û demokrasiya civakî jî, Kurd jî ber ku bi hejmar (statîk) kêmîr li giştî Îranê ne û bo nimûne kêmîr ji Farsan û Azeriyan in, dikaribin hertim di kêmaniyê de bîminin û mafê wan bi vî awayî di bin tehlûka pêpeskirin û pelixandinê dikeve. Ji ber ku şansê Kurdistan jî bo bîdestveanîna piranî yan jî kêmaniyek bihêz hetanî bikaribe berevanîyê jî mafên xwe yên netewî bike, tune. Ji bilî vê yekê demokrasiyên ku li serê qala wan hate kirin, piranî giraniyê didin ser takekes (individual) û takegir, hetanî civakgiriye. Lewma jî bo bersîva demokrasiyê bi pîrsa netewî, berhevdana alternatîvên demokratîk hewce ne. Ji bo bersîva wê yekê gelo çî demokrasiyê bersîva hewcehiya Kurdistan dide? Di vê beşê de em dê nêzîkbûna modelên demokrasiyê bi pirsgerîka netewî bixin ber hev.

Îran welatekî pêkhatî jî gel, netewe, ol û eşîrên cur bi cur e. Mizayîka netewî, çandî, olî û çîneyetiya Îranê di sedsala 20'an de ber bi alozî û tevliheviyê diçe. Di dawiya sedsala bîstan û destpêka sedsala bîst û yekan da pîrsa netewî û çareserîya pirsgerîka kêmaniyên netewî û olî ne tenê pîrsa Kurdistan, belkî xwe hilkişand bo Azerbaycan, Xozistan, Belûçistan û Turkemenistana Îranê jî. Lewma jî bo ku ew mizayîke bikaribe bi awayekî nerm û aştiyane û weke hinek kesan ku xweziyê dixwazin yekgirtî bîmine, diviya pir çandî, zîmanî, olî û netewî ya Îranê bê îtirafkirin û bi wê gorê jî şaristanîyek hevgirtî û aşî jî bo pêşeroja Îranê bihê misoger kirin. Di vê mêzegehê de demokrasiyê xewna havbeş ya hemû gelên Îranê ye û jî bo bîdestveanîna wê îdeale piraniya hêzên siyasî yên gelên Îranê ên bindest û hinek **hêzên seranserî** jî xebatê dikin. Lê çawa demokrasiyê xewna gelên Îranê ye, her di şûn de jî cihê nîgeranî û meraqê ye jî.

Hevdem tevî pîrsa netewî li Îranê û welatên derdorê, pîrsa çîhanîbûnê hinek modelên hakim li demokrasiyê ber bi kevnûbûnê ve birine û ew jî bo bersivdan bi hewcehiya çîhana teknolojîk û Global cihê xwe bi alternatîvên nû didin. Demokrasiya kîlasîk a lîberal, dewleta netewî, yek netewe bûn û herêmçetî û tak kulturî û tak çandî cihê xwe li coxrafiya siyasî û defterên siyasî yên Rojava çol dikin. Li welatê Îranê jî ku zêdeyî 100 salan dîroka xebat jî bo demokrasiyê heye, wateya demokrasiyê û demokrasiyewaziye hatiye guhertin.

Pîrsa netewî û kêmaniyên etnîkî, yek ji pirsên herî girîng yên demokrasiya serdema nû ye. Di pêwendî tevî Îranê de, berî pêkhatina sistemek demokrasiyê, çar heger weke astengên ser rêya pêkhatina sistemek demokratîk tînin mêze kirin:

1. Hewla damezrandina dewleta yek netewî û yek zîmanî bi navê netewa Fars.



Kurmanc Hakkî

kurmanchakki@yahoo.com

2. Hewla jî bo asîmîlekirin û helandina netewên din di nav netewa Fars de.

3. Sazkirina dewletê li ser bingeha pêşvebirina yek zîman, yek kultur û jî bîr kirina zîman û kultur û dîroka netewe û kêmaniyên din di Îranê de.

4. Bîkaranîna ol û ayîna Şîe wek çeka ayînî dijî kêmaniyên din yên neteweyî, bi xasmanî kêmaniyên Sunnî û pêrewên ayînên din.

Nasyonalîzma netewên bindest hemû xebata wan bo jî nav birina ew hegerên ku li serê qala wan hate kirin, bûye û jî bo beşdariya wekhev di dabêşkirina desthilata welat da. Ew berxwedana bûye hegera pêkhatina pîrs û konfliktê netewî ku dewletên hakim li ser Îranê bi navê parastina yekîtiya axa welat hemû xebatên jî bo demokratîze kirina Îranê, parastina mafên kêmaniyên serkut kirine.

Di serdema nû de gelek hêz û aliyên Îranî dixwazin di Îranê de pîrsa demokrasiyê bi modela Lîberal pêşve bibin. Armanca wan hêz û kesane homojênkirin yan yekrengkirina Îranê tê dîtin. Demokrasiya bi vî awayî jî nikaribe bibe cihê alîgiriya netewên weke Kurd an netewên din yên bindest ên Îranê. Ji ber ku di serdema nû de xebat dijî yekrengkirin û homojênkirina civakê gelek hêsantir û jî ber bûna çavkaniyên ragihandinê û kanalên pêwendiyê, mobîlîzekirina xebat û nerazîtîyê dijî yekrengiyê hêsantir ji demên derbazbûyî ye. Lewma pênaseya demokrasiyê wek sistemek ku hikûmet bi dengê azad û piraniya welatiyan bihê hilbijartin, nikaribe bersîva pirsên pêwendîdar bi Îran û netewên Îranî bide. Pênaseya han dibe sebebê wê yekê ku gelek welatên ku dîktatorî ne xwe bi demokrat binasînin. Yek ji van Komara Îslamî ya Îranê ye ku her çar salan carekê hilbijartinên Serok Komariyê û Parlemanê dike û bi wê şiroveya han dikaribe xwe bi welatek demokrat û sistema xwe bi sistemek demokratîk bizanibe.

Çawani û kalîteya¹ demokrasiyê girêdayî bi şeweya nûnerayetiya xelkê jî aliyê hikûmetê, wekheviya welatiyan hemberî yasayan û di piratîk da, mafên wekhev yên siyasî û civakî yên welatiyan, yasayîbûna dengê welatiyan, toleransa siyasî û yasayên giştî yên parlemanî, kêmbûna derfet û delîveya navbera û tax çînen civakê, azadiya sazî û êlîfîti siyasî, nûnerayetiya siyasî ya hemû girûpên civakî û çawaniya baldana bi xwastên

neraziyan û kêmaniyên civakî ye.

Ji bilî vana radeya ewlathî û cihgirbûna sîstema siyasî ya welat, nişana asta demokrasiya welat e. Demokrasiya misoger li hember giriftên dem bi dem berxweder e û pêş dikeve. Cihgir nebûna demokrasiyê bi wateya ne çareserkirina pirsgrîkên nava civakê tê. Demokrasiya cihgir rêçareya aştîxwazane ji bo çareserîya pirsgrîkan digire pêş. Demokrasi bi vî awayî bi du hêlan tê parve kirin: Demokrasiyek ku giraniyê dide induvîdualîzmê, wate takekes û demokrasiyek ku mafê etnikî û netewî jî ber çav digire. Her yek ji wana xwediyê jêr koma¹ xwe ne ku bi kurtî li jêr dê bikevin ber bas:

Lîberal demokrasiya li ser bingeha takekesî

Di wê cure demokrasiyê de dewlet li ser bingeha pîrsa welatîbûnê hatiye damezrandin. Demokrasiya han, mafê takekes diparêze û ji takekesan dixwaze wezîfe û erka xwe hemberî demokrasiyê cî bi cî bikin. Girêdayîbûna netewî di demokrasiya lîberal de hatiye jinavbirin û mirov wek takekes hatine cudakirin û berçavgirtin. Bi vî awayî girêdayîbûn bi kêmaniyek netewî di bin tehlûka qedexê kirinê de ye. Her çend takekes dikaribe xwe îfade bike, lê takekes wek endamê civakê di bin tehlûka asîmilasyonê de ye.

Li demokrasiya han de kêmaniyên netewî û netewe jî xizmetkar û koleyên parastina dewletê tên hesabkirin. Civak wek pêkhatêyê pirnetewî, kulturî û ayînî nayê dîtin, belkî bi pêkhatêyê jî takekesan û tenê takekesan tê dîtin. Demokrasiya han, diji pirçandî û pirrengiya civakî ye.

Lîberal demokrasiya komarîxwaz

Demokrasiya komarî ya lîberal weke xuya ye sîstema herî zaf hatî piratîke kirî di welatên Rojavayî de bûye. Her wekî demokrasiya lîberal di demokrasiya komarî ya lîberal de jî mafên takekes hatine misoger kirin, lê mafê kolektîv qedexe ne. Bi watayêke din takekes hemû mafên wî hatine garantî kirin, lê komek ji takekesan ku bi awayekî hevbeş girûpek pêk anîne, mafê wan nehatiye misogerkirin. Lê berevajî demokrasiya lîberal, demokrasiya komarî ji bilî bi fermî nasîna dewleta netewî, bawerî bi hebûna civak û kêmaniyên civakî ku xwediyê ziman, çand, ol û nasnameya cuda jî ne, heye. Lê dewlet li ser bingeha ziman û çandekê hatiye damezrandin ku hemû kêmaniyên din diviya pêrewiyê lê bikin. Welatîtiya yasayî û zanîna ziman û çanda dewletî merca welatîbûnê di wê demokrasiyê de ye.

Demokrasiya komarî ya lîberal welatiyan li gor beşdariya wan di pêkhatina berjewendiyên hevbeş de cuda dike. Xala bihêz a wê demokrasiyê ewa ye ku her welatîyek dikaribe xwe bi xwediyê zimanekê bizanibe. Welatîbûn ne girêdayî bi ol, ziman, çand û regezê ye. Demokrasiya komarî ya lîberal li hember guherînên civakî de vekirî ye.

Alîgirên demokrasiya pirçandî, demokrasiya komarî ya lîberal bi nûnerî nekirina kêmaniyên netewî û kulturî tawanbar dikin. Di vê

demokrasiyê de tîrsa asîmîlebûnê li ser gelek netewe û çandan heye û bi vî awayî tîrsa wê heye ku çewisandin û pelixandina mafên kêmaniyên bibe bingeh û çandêke heta heyatî ya hikûmetê. Bo nimûne demokrasiya Tûrkiyê û qedexekirina ziman, çand û ragihandinên Kurdî yê li Firansayê de ku yek ji welatên demokratîk yê cihanê tê hesibandin, "Corsicans" bi awayekî fermî û berdewam tîna haşakirin û mafê wan tê pelixandin. Rê li keçên Misilman tê girtin ji bo berkirina kincên Îslamî.

Hêzên seranserî yê Îranê yê ku ji aliyê neteweya serdest ve tîna nûnerayeti kirin, alîgirê demokrasiya Lîberal û demokrasiya komarî ya lîberal in. Ji ber ku bi hizra wan di wê demokrasiyê de him yekîtiya axa Îranê tê parastin, him jî azadiya takekes bi nasîna cudahiya civakî û etnikî¹ ya civaka Îranê tê berçavgirtin û pirsgrîkên din jî bi rêya pêşveçûna rewşa aborî ya welat dê çareser bibin. Dewletên Ewropî ku xwediyê demokrasiya lîberal ya komarî ne, bi sedan salên derbazbûyî gelek kêmaniyên navxwe bi awayên dîlxwaz yan sîstematîk asîmîlê û ji nav birine. Jînosayda zimanê zikmakî li welatên Ewropî beşek ji dîroka reş ya pêkhatina dewleta netewî ye. Lewma serbarê wê yekê ku îro demokrasiya Ewropî hatiye guhertin û naveroka xwe bi alternatîvên taze dide. Dubarekirina ezmûna geşekirina demokrasiyê li Ewropa li ser Îranê dê bibe hegera ji navçûna gelek netewe û kêmaniyên nava Îranê.

Demokrasiya "konsosiyonal" (Pirali)

Demokrasiya "konsosiyonal"¹ paş ji navçûna desthilata kolonyalist û dagirker ya welatên Rojava û tîkçûna demokrasiyên lîberal li welatên taze serxwebûyî ên Asyayî û Afrîqayî hat geşekirin. Piştî serxwebûna dewletên weke Hindistan, Pakistan û Dewletên serbixwe yê din yê Afrîqayî demokrasiya li ser bingeha dengên piranî tûşî tîkçûne bû û nekarîbû bersîva hewcehiya siyasî ya welatên taze serbixwe bide.

Di pirtûka xwe de "Lijphart"¹ sîstema siyasî ya hin welatên Ewropî bi demokrasiya ne-lîberal, "konsosiyonal" û niv-konsosiyonale demokratîk nas dike. Welatên weke Swîs, Beljîka, Kanada û Finlanda minakên welatên "konsosiyonala", demokratîk tîna bas kirin. Li demokrasiya konsosiyonal dewlet mafê netewî û peloralîzma netewî, çandî, olî û etnikî ya welat bi fermî nas dike. Kêmaniyên netewî xwediyê mafê otonomîya deverî, zimani, çandî û ragihandinê ne. Mafê hemû kêmaniyên netewî heye ku ji bo pêşveçûna nasname û kesayetiya netewî ya xwe bi awayekî fermî û eşkere sazîyên xwe pêk bînin. Demokrasiya han li ser bingeha otonomîya siyasî ya netewên pêkhatîr ên welat pêk hatiye, ku her yek ji wan li gor beşa xwe beşdarê desthilata siyasî dikin. Siyaset di vê sîstemê de li ser bingeha pêkhatina berjewendiyên hevbeş hatiye avakirin. Parleman nûneratiya hemû kêmaniyên netewî û civakî dike û netewên pêkhatîr yê welat mafê wetoyê hene di hember wan yasa û destûrane de yê ku mafê wan pêpes dike. Dewlet alîgiriyê li tu aliyên xwedî pîrs nake û hewl dide pîrsên pêwendîdar bi dever û hikûmetê bi awayê

diyalog û lihevkerîne çareser bike.

Bi dîtina "Lijphart" demokrasiya han baştirin bersîv e bi wan welatan ên ku pîrnetewe û pirçand in. Sîstema birêvebirinê di vê demokrasiyê de di navbera pêkhatîrên welat bi awayekî wekhev û li gor pêkhatêya netewî û etnikî ya welat hatiye parve kirin. Bi watayêke din federalîzm an konfederalîzma siyasî di vê sîstemê de li ser bingeha girêdana netewî û cuxrafî ya pêkhatîrên welat hatiye berçavgirtin.

Rexnegirên vê sîstemê ji bilî qal bi tîrsa cudabûn û perçebûna welat, tîrsa nebûna azadî û serbestiya takekes tînin holê û wê sîstemê bi sîstemek hêdî û ne serkevtî didin zanîn. Nimûna wê jî Lubnanê tînin ku ji ber guhertina demografiya welat di çendîn salên derbazbûyî da, Lubnan bûye yek ji navendên ne ewlahiya siyasî û şerê navxweyî.

Demokrasiya pirçandî

Hizra Demokrasiya pirçandî an çendçandî li encama veguhartinên civakî yê Ewropa û Amerîkaya Bakûrî li ber koçberan hate holê, ji bo rêzgirtin û bêtir tîgihîştina kêmaniyên etnikî, zimani û çandî yê nava welatên Rojava de. Demokrasiya pirçandî berhema xebat û berxwedanên kêmaniyên etnikî di nava welatên han bû ji bo nasnameya çandî û mafê nûnerayeti kirin di biryarên siyasî de. Alîgirên lîberalîzmê roj bi roj zêdetir digihin vê tîgihîştinê ku bêtir rêzgirtin û bi fermî nasîna mafên çandî û etnikî yê cur bi cur ên nava civakê, mafê takekes û îndîvîdual nayê misoger kirin. Hin alîgirên lîberalîzmê tagiriya berfirehkirina mafê çandî dikin. Ji ber ku bi hizra wan **mafê cudahiye**¹ mafê mirov e û ne kêmtir ji mafê hîlbijartina ol, hizra siyasî û mafê sîvil (Young 1990) ye.

Demokrasiya pirçandî di navbera lîberal demokrasiya komarî û konsosiyonal de cih digire. Hin hizirvan li ser vê bawerê ne ku demokrasiya pirçandî baskêk din yê lîberal demokrasiyê ye (Kymlica 1995). Hin jî vê demokrasiyê zêdetir konsosiyonal dibînin (Yonah 1990). Demokrasiya pirçandî di gelek waran de mîna demokrasiya lîberal e. Her du bêtir berçavgirtina girêdayîbûna mirov bi etnikêk taybetî, alîgirê çemka welatîyê/a wek tak in. Ji bo her duyan bingeha dewletê îndîvîdualîzm û takekes e. Her du şêwaz alîgirên hat û çûn û hîlbijartina azadane ya welatiyan di nava welat de ne. Her du sîstem alîgirê tîkeliya xwînî ya pêkhatêya civakî ne û bi vî awayî alîgirê asîmîlebûna civakê di nava hev de ne.

Bi hizra "Van den Berghe" (1999) demokrasiya pirçandî asîmîleya kêmtir ji lîberal demokrasiyê heye. Bi hizra wî "demokrasiya pirçandî bêtir bi fermî nasîna çandan dergehên wê bo pirçandîti û cudahiye vekirîye. Demokrasiya han dixwaze pirsgrîkên paş-sinetiyê¹ bi awayê hevsaî û bêtir ku rê bide çanda piranî yê din asîmîle bike, çareser bike. Demokrasiya han, dixwaze bêtir asîmilasyon û bîfermî nasînê, çandên civakî întegire bike."

Demokrasiya pirçandî her wisa cudahî tevî

liberal demokrasiyê de heye û dix hinek waran de mîna demokrasiya konsosiyonal e. Demokrasiya pirçandî, neteweyê ji dewletê cuda dike, bi watayêke din dewleta netewî cihê xwe dide bi dewleta pirçandî. Wek "Van den Berghe" dibêje: "Cudahiya demokrasiya pirçandî bi liberal demokrasiyê re di vê de ye ku ew netewe û dewletê ji hev cuda dike û bi awayekî vekirî îtirafê bi pirçandî bûna welat dike û nîşan dide ku welat ne homojên." Netewe bi vî awayî pirçand û piretnîk e. Bi vî awayî kesên ku ne ser bi netewa serdest yan netewa piranî ne, di hember yasayê de xwediyê maf û erkên wek hev in.

Di demokrasiya pirçandî de şansê asîmîlebûnê kêmtr ji liberal demokrasiyê û zêdetir li demokrasiya konsosiyonal e.

Girifta demokrasiya pirçandî di vê de ye ku serbarê wê yekê ku dewlet bi awayê fermî pirçand e, bo nimûne her kes azad e li hebûna ol û çanda xwe û piratîkekirina wê, lê beşdariya partî û hêzên etnîkî di dewletê de berevajî demokrasiya konsosiyonalîst karek dilxwazane ye. Bi wê wateyê ku eger partiya piranî bixwaze van partiyên kêmaniyên etnîkî li koalîsyona dewletê beşdar bike. Lê ger nexwaze mecbûriyek ne di kar de ye. Bi wateyêke din beşdarîkirina kêmaniyên etnîkî di dewletê de pirseke fermî ye nek yasayî. Lê di demokrasiya konsosiyonal de erka yasayî ya dewletê beşdarîkirina hemû aliyên civakê ye di pêkhatiya dewletê de. Dewletên weke Bîrîtanya, Holanda ku xwediyê dîroka kolonyalîzmê ne, bi awayekî berfireh ber bi hilbijartina demokrasiya pirçandî diçin û reşçerman ji di kabîna dewletê de beşdar dikin. Hin dewletên weke Zelanda Nû (News Land) kêmaniyên etnîkî yên wek "Maorî" ku rûniştvanên serekê yên wî welatî ne, bi awayê fermî nasîne û ji bo wan otonomiya deverî qebûl kiriye. Di Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê de demokrasiya pirçandî bi beşdariya reşçerm û jinan di dewletê de tê xuya kirin.

Lê wek tê dîtin cudahiyan neteweyî û pîrsa netewî di vê demokrasiyê de bi awayekî herî kêm tê nûneratî kirin. Bi vî awayî demokrasiya pirçandî nikaribe bersîva pîrsa netewî di welatên weke Îranê de bide.

Demokrasiya etnîkî

Demokrasiya etnîkî sistemek siyasî ye ku tê de takekes û girûpên pêkîner yên welat dikaribin welatîyê dewletê bin, bi awayekê ku mafê hakimiyetê bo netewa serdest an piranî bi fermî bizanibin. Bo nimûne li Îsraîlê kêmaniyên Erebi xwediyê serbestiya siyasî, çandî û etnîkî a xwe ne û wek welatîyên Erebi tînas kirin, bi mercekê ku hakimiyeta hertimî ya Cihûyan wek piraniya reha (mutleq) nas bikin. Li rastî de di demokrasiya han de neteweyek ji ber hebûna piraniyê tenê mafê çandî bo kêmaniyên din bi fermî nas dike û biryarên yasayî, guhertin li destûra welat bi dilê netewa serdest dibe. Dewlet li demokrasiya etnîkî mafê netewa serdest e, nek hemû welatîyan.

Kurtiya basê

Cedwela jêrîn di kurtî alternatîvên demokrasiyê berhev dide. Her du sistemen libêral li her sê sistemen din bi hegera bi fermî

nenas kirina kêmaniyên çandî û netewî tînas cuda kirin. Demokrasiya konsosiyonal mafê kêmaniyên bi awayê herî berfireh misoger dike. Di wê demokrasiyê de otonomiya çandî, deverî, siyasî û beşdariya nisbî¹ di dewleta navendî de wek maf bi fermî tê nas kirin. Demokrasiya pirçandî mafê çandî û cudahiyan bi welatîyan dide û rê dide wan xwe rêk bixin, lê mafê kolektîv bo kêmaniyên bi fermî nas nake. Demokrasiya pirçandî mafê otonomî û parvekirina desthilatê bi kêmaniyên nade. Demokrasiya etnîkî mafê etnîkî bi kêmaniyên dide, lê rêya wan digre li beşdarî kirin di desthilatê de û pêşiya tehlûka tîkçûn yan ji destdana piraniyê li netewa serdest digre. Sistema etnîkî mafê kolektîv bo beşdarîkirin di desthilatê de tevî netewa serdest qedexa dike. Cudahiya demokrasiya etnîkî tevî sistemen din serbarê bi fermî nasîna kêmaniyên etnîkî, li nebûna mafê wekhev di navbera pêkînerên civakê de ye.

Bi kurtî libêral demokrasiyê alîgirê **wekheviya welatîyan**, *lê ne alîgirê cudahiya welatîyan* e. Demokrasiya pirçandî serbarê bawerî bi çend çandîyan di nav civakê de, alîgirê **wekheviya siyasî lê ne cudahiya wan** e. Demokrasiya konsosiyonal alîgirê **wekhevî û cudahiya pêkînerên welat** e. Demokrasiya etnîkî alîgirê **cudahiyê lê ne wekheviyê** ye.

Sîstem	Libêral demokrasiya indûidualist	Libêral demokrasiya komarî	Demokrasiya pirçandî	Demokrasiya konsosiyonalist	Demokrasiya a pirçandî
Taybetmendî					
Hebûna minîmomên mercên demokratîk	Erê	Erê	Erê	Erê	Erê
Karaktêra dewletê	Kom bûna welatîyan (civîna welatîyan)	Dewleta netewî ya sîvîl	Dewleta pirçandî	dewleta pîrnetewî yan koalîsyona netewan	Dewleta netewî ya etnîkî
Hebûna mafê wekhevî yê takekesan	Erê	Erê	Erê	Erê	Heta asteke zaf
Mafê kolektîv	Ne	Ne	Erê, lê li yasayê de nehatiye	Yasayîye	Yasayîye
Yeksanî li mafê kolektîv de	mafê wîlo nayê nasîn	mafê wîlo nayê nasîn	Erê	Erê	Ne
Bêalîtiya dewletê	Erê	Erê	Erê	Erê	Ne
Siyaseta asîmilasyonê	Ne	Erê	Ne	Ne	Ne
Asta asîmilasyonê	Bilind	Bilind	Navend	Asîmilasyon tune ye	Hegerên wê zaf in
Mekanîzma çareserîya pîrsgirêkan	Wekheviya mafê takekesan û derfetên wek hev, welatperwerî a destûrî, asîmilasyon	Wekheviya a mafê takekes û delîveyên wekhev. Pêkanîna dewleta netewî bi çandek homojên û yek reng, lihevkerî li ser nîrxên hevbeş, heta astekê ji asîmilasyon	Wekheviya a mafê takekes û derfetên wekhev, nasîna hebûna çand û kulturên din û lihevkerî a li ser berjewendiyên hevbeş û çanda homojên, heta astekê ji asîmilasyon	Wekheviya mafê takekes û delîveyên wekhev, lihevkerî li ser dewletek çand netewî, parve kirina adîlane ya dahat û sernayeya welat, otonomiya berfireh ya deverî û netewî, dabêşkirina desthilatê, mafê wetoya deverî, siyaseta lihevkerî û saz û konsensosê	Cudahiya berfireh ya li navbera takekesan di maf û delîveyan de, berfirehiya mafên kolektîv, desthilat bi destê netewa serdest yan piranî ye, kontrola berxwedan û dijberiyên kêmaniyên û pêşgirtin ji serhildanên wan ji aliyê dewletê ve.

Gelek fakterên cihanî, deverî û navxweyî Îranê an ew welatên ku Kurdistan di navbera wana de hatiye parvekirin, piraniya alternatîvên demokrasiyê ji bo pîrsa Kurd çareseriyê pêşkêş nakin. Demokrasiya konsosiyonal belkî şewaza herî baş li çareserîya pîrsa netewî li Îranê û xasmayî pîrsa Kurd tê berçav. Di vê mêzegehê de federalîzma ku mafê serwerîya siyasî ya gelê Kurd li ser axa xwe bi fermî binase û coxrafî û çarçoveya sinûrên Kurdistanê li gor belgeyên dîrokî, aborî û civakî û wîsta piraniya gelê rêçareya ne îdeal, lê rêalek adîlane ye ji bo pîrsa Kurd û netewên Îranê yên bindest. Tevî wê ji bo parastina berjewendiyên netewî û rewşa pirçandî ya Kurdistanê hilbijartina şewaza pirçandî ji bo birêvebirina navxwe ya Kurdistanê him mafê kêmaniyên etnîkî û ayîni misoger dike, him wekheviyê ji bo welatîyan misoger dike û pêşiya tîkçûna demografiya Kurdistanê bi berjewendîya neyarên Kurdistanê digre.

Çavkaniyên gotarê di arşîva Agirî de parastî ne.

Lênihêrînek Li Ser Pirsgirêkên Civaka Îranê

Amadekirin: Hemîd Muxtarî

↑ ro rojê pîrsgirêkên civakî yên civaka Îranê bi xasmanî îtiyad, îdz, fehşa, helatina mêjiyan, qaçaxa keçan, telaq, meraq û wd ... yek ji bas û

gengeşeyên rojane ên dezgehên ragihandinê weke televîzyon, radyo, rojname, malper, kovar û wd ... çî di navxwe û çî li derveyî welat de ye û her rojê serhejmariyeke nû li ser van pîrsgirêkan tîn weşandin ku mixabin roj li pey rojê xirabtir bûna vê rewşê didin kifşê.

Divêt were gotin ku civaka Îranê niha yek ji rekordarên van arîşe û pîrsgirêkane di cihanê de ye ku nîvê ji nîfûsa Îranê tûşî van pîrsgirêkane bûye. Rejîma desthilatdar ya Îranê heya niha tu gaweke erênî di vê derheqê de ne avêtîye. Piraniya xwedîra li ser vê baweriyê ne ku xizanî û betalî yek ji sebebên bîngêhî yên van hemû arîşe û giriftane di Îranê de ne.

Herçiqas ku di vê derheqê de serhejmariyeke rast û berfireh ne li ber dest e, lê hinek girove û dukomentên zaf di vê derbarê de hene ku em dê li vir de qala çand ji van bikin.

Xizanî û belengazî

Li gor rapora nûçevaniya Fars, weşana lêkolînê aborî ya Rohîlata Navîn (MIS) mijara betalî û bêkariyê di Îranê de li hemû warên aborî, civakî, çandî û ramyarî de yê daye ber girove û dahûrandinê.

Rapora han dide eyan ku kirîza bêşoliya xurt di Îranê de 40 ji sedê ya nîfûsa xelkê vî welatî ku qasê 29 milyon kesan pêk tîne, xistiye bin hêla xizanî û belengaziya mutleq û navincî de.

Ev weşane herwisa dide zanîn ku pêka serhejmariyên vê dawiyê ku Rêxistina Rihetiyê (Rifah) daye nîşandan, 12 ji sedê ya xulyaqeta vî welatî ku dike 9 milyon kes, di bin hêla birçibûn û xizaniyê de dijîn û %17 yanî 11 milyon kes jî belengaz û feqîr in. Encama lêkolînan nîşan dide ku bêşolî sedema herî girîng vê qasê xizaniyê di Îranê de ye.

Îtiyad

Li gor rapora sala 2005'an ya Rêxistina Neteweyên Yekbûyî ku ji aliyê Rojnameya **Washington Post** ve hate weşandin, Îran rekordar û hejmara yekem ya mutadan (kesê/a ku madeyên sirker bikar tînin) di cihanê de ye. Bi awayekê ku %2/8 ji nîfûsa 70 milyonî ya vî welatî mutad bi madeyên sirker in û di vê derheqê de Îran di cihanê de bêrikeber e.

Li gor rapirsîya dewleta Îranê ku nûçevaniya Fars weşandiye, hatiye zanîn ku %80 ji xelkê Îranê li ser vê baweriyê ne ku tîkiliyek rasterast di navbera bêkarî û bikaranîna madeyên bêhişker de heye, çunkî dewlet nikare yek milyon karan ji bo wan ciwanên ku her sal tevî bazara kar dibin, pêk

bîne.

Helatina mêjiyan

Tê gotin ku her salê 100 hetanî 225 hezar kes ji zana, şareza û xwendekarên Îranê û pîsporên akademîk seba nebûna kar, yan rewşa nebaş ya siyasî, civakî û çandî ya Îranê ku dibe seba dijwarbûna jiyanê, nebûna îmkânat û feqîriya zanîngehên Îranê yan qebûl nekirina îdeolojiya sîstema desthilatdar û sedemên cur bi cur yên din



... welatê xwe bi cih dihêlin û koçberî welatên biyanî dibin.

Pêka serhejmariya Sindoqa Navneteweyî ya Dirav, Îran di warê revîna mêjiyan, di nava 91 welatên li halê geşekirinê û yên geşenekirî yên cihanê de di pileya yekem de ye.

Herwiha nûçevaniyan karê Îranê, (ÎLNA), li zimanê Elî Asmend şûnkarê zanistî yê Besîca Xwedekariya Îranê dibêje: ku ji her 96 xwendekarên ku bo derveyî welat tîn şandin, tenê 2 kes ji wan vedigerine welatê xwe û 90 kes ji 125 xwendekarên hîlbijartî ji bo pişikdarîkirin di olempiyadên zanistî yên cihanê, niha di zanîngehên Amerîka û Ewropayê de xwendina xwe didomînin.

Hêjayî gotinê ye ku Îran her salê bi qasê çend milyon dolaran ji revîna mêjiyan zirarê dibîne. Nêzik 2 milyon û 500 hezar Îranî li derveyî welat dijîn ku 60 ji sedê ya wan akinciyê welatê Amerîkayê ne. Herwisa 2000 kes ji mamostayên zanîngehan di Amerîkayê de Îranî ne û 5 hezar Îranî jî di Amerîkayê de xwediyê medreka duktorayê ne û pêka serhejmariyan kêmaniyên herî xwendewar di Amerîkayê de Îranî ne.

Îdz (HIV)

Pêka gotina Dr. Mîna Mehrez şarezaya nexweşiya îdzê û nexweşiyên îfûnî di Îranê de û endama komîteya xebata dijî îdzê, pitir ji sed hezar kes di Îranê de tûşî nexweşiya îdzê ne ku zêdetir ji 11 hezar kes ji wan hatine nas kirin. Wê di hevpeyvînekê de ku tevî nûçevaniya Fars di Îranê de encam daye, îtiyad û tîkitiyên

zayendî weke yekemîn sebebên xurtbûna îdzê di Îranê de daye zanîn. Li pey axaftina wê, serhejmariyên berê yên Wezareta Saxlemiyê eyan dikin ku nêzikê %55 tûşbûyên nexweşiya îdzê ji rêya pîs û nepaqîjbûnê bûye û 30 ji sedê jî ji rêya tîkiliyên zayendî tûşî vê nexweşiyê bûne.

Ji hev veqetiyên (telaq)

Li gor serhejmarî û lêkolînên di sala 1380' (2001)an de ku di deftera kar û barên civakî ya Wezareta Hundir û navendên kar û barên pişikdariya jinan hatiye encam dan, ji her 7 zewicînên ku di Teheranê de tîn encam dan, yek ji wan tûşî berdan û telaqê dibe û pitir ji %80 dawxazkarên telaqê jin in.

Piraniya karnasan seba herî girîng ya xurtbûna serhejmariya telaq û ji hev veqetiyên, bi hebûna telabelayiya heyî di civaka Îranê de, yanî bêkarî, nerihatiyên ruhî, zêdetir bûna îtiyadê, berfirehbûna asta çavnihiyên û temenê zewicînê, nebûna nasyariya jin û mêran bi hev re, ji sebebên bîngêhî yên ji hev veqetiyên di Îranê de dizanin.

Divêt were gotin ku di dema hatina serşola rejîma Komara Îslamî ya Îranê heta niha pêkhatina pêwendiyên di navbera kur û keçan li derveyî çarçoveya zewicînê ne yasayî tê hesabkirin û memûrên Întizamî, Besic, Sipah û wd... li dema dîtina keç û kuran bi hev re, wan weke sûçbaran binçav dikin. Ev pirsane dibîne sebebê wê çendê ku pêkanîna jiyanê di Îranê de hêdî hêdî ne tenê ji bo ciwanan, belkî ji bo malbatên wan bibe kirîzeke mezin.

Ev qeyran û kirîzane li cem astengên aborî bûne sebeb ku temenê zewicînê di Îranê de here serê, bi awayekê ku navinca temenê zewicîna keçan îro rojê 25 sal e û ya kuran jî 30 sal e.

Meraq

Lêkolînên civakî diyar dike ku bêtirî %40 ji xelkê Îranê tûşî Meraqê bûne. Pêka van lêkolînan ev nexweşiya di navbera ciwan û jinan de xurtir e û sedemên tûşbûna bi vê nexweşiyê, guhartinên yekcarî yên civakî, şer, feqr û cudahîdanên civakî, xizanî û kêmasî, tîkşikan, zîndan, tepeserkirina xwestekan û zaf pîrsgirêkên din ku me di destpêkê de anîn ber bas, tîn hesabê.

Herwiha yek ji sebebên herî girîng yê mifah wergirtin ji madeyên sirker yan xwekuştin û helatin ji malê, çêbûna meraqê di navbera wan de ye. Niha pirsîyar eva ye ku çî tiştê bûye sedema çêbûna van derd û nexweşiyên civakî?

Bersiv ron û eşkere ye! Her wek ku me di destpêka vê nivîsarê de yî qala vê kir yek ji sebebên herî girîng yên çêbûna van arîşane nebûna kar, mifah newergirtin ji şarezaiya takekesan, nebûna tenahiya civakî, nebûna îmkânatên pêwîst yên lêkolîn û dahûrandinê, heta di xwendingehên herî baş yên Îranê de, ku evane jî hemû vedigerin ser nebûna azadî û demokrasîyê di Îranê de û nebûna dewleteke bersivder û xelkî ku li hember xelkê Îranê berris be. Tenê rêya ku dikare van pîrsgirêkane ji nav bibe, hilweşandina vê rejîmê û anîna ser şola sistemeke demokratîk di Îranê de ye.

Zêdetir Ji 115 Milyon Zarok Naçin Xwendingehan

Zêdetir ji 115 milyon zarok di temenê dersxwandinê de naçin

xwendingehan û piraniya wan zarokane endamê malbatên xizan û belengaz in ku dayikên wan nexwendawan in.

Herwiha ji her 10 zarokên ku naçin xwendingehan, 8 zarok li welatên Başûrê Deşta Afrîqayê û Başûra Asiyayê dijîn. Ev welatane ji wan welatan in yên ku hejarî û newekhavi ne tenê di



wan de kê m nebûye, belkî zêdetir jî bûye.
Çavkanî: "Irna"

2 Milyon Zarokên Kedkar Neçar Bi Encamdana Karên Bixeter In

Her çiqas li gor nûtirîn raporên fermî, di Asiya û herêma Oqyanûsayê, hejmara zarokên kedkar û çeleng yên aborî kê m bûye, lê eva pir kê m e. Li gor serhejmariya Rêxistina Navneteweyî ya şolê (ILO), piraniya zarokên kedkar temen 5 heta 14 salî, di van herêman de dijîn û nêzik bi 122 milyon zarokên kedkar yên



cîhanê di van herêman de ne ku 62 milyon kes ji wan zarokane neçar bi encamdana karên bi tirs û bi xeter in.

Jêder: "gooya news"

Rewşa Nebaş Ya Ciwanan

Rêxistina Neteweyên Yekbûyî di raporekê de li ser rewşa ciwanan, diyar kir: "Niha 113 milyon ciwan ji xwindinê bêpar in û 88 milyon bêşol in û 10 milyon kes jî tûşî nexweşiya îdzê bûne."

Herwiha zêdetir ji 500 milyon ciwan jî di cîhanê bi dahateke kêmtir ji 2 Dolaran di rojê dijîn.

Li gor rapora Rêxistina Neteweyên Yekbûyî



nexweşiya îdzê û tund û tûjî û birîndarî sê sedemên bingehîn yên mirina ciwanan di cîhanê de ne.

Jêder. "aftabnews"

370 Milyon Kes Ji Xelkê Ne Xwecih Belengaz In


Sekreterê Giştî yê Rêxistina Neteweyên Yekbûyî, Kofi Enan, di peyamekê bi hinceta Roja Cîhanî ya Xelkê Ne Xwecih got: "Xelkê ne xwecih tevî wan kosp û astengan berengar in yên ku bi sedema hejarî û newekheviyê li ser wan de hatiye sepanandin û herwiha 320 milyon kesên ne xwecih di 70 welatên cîhanê de tevî belengaziyê berbirû ne.



Kofi Enan zêde kir ku divêt gavên micid ji bo kê m kirina belengaziyê û ji navbirina newekheviyê bihê hilgirtin
Çavkanî: "akhbarrooz"

Jinek Erebbû Endama Nasayê

Yekemîn welatiya Erebiyana Seûdî ji bo karkirinê tevî Nasayê bû, jin e. Li gor nûçeyê rojnameyê kuweytî bi navê "El Siyaset" bo yekemîn car jinek xelkê Erebiyanê karî di Nasayê de kar bike, li gor vê raporê Mişel Elsamir ku derçûyê Kaleja Filorîdayê û xwediye medreka teknoloji ji Melbornê ye û medreka Endazyariya stêran e, di Nasayê



hate qebûlkirin û niha jî mijûlê karkirin li ser mahvaneyekê seqanasiyê ye.

Jêder: "rassaa.com"

Dilara Tê Îdam Kirin

Dilara keça ku bi kuştina jineke 65 salî gunehbar e, bi îdamê yê hatiye mehkûm kirin. Eva di halekê de ye ku temenê Dilara jêr 18 saliyê ye. Dilara di çalekê de tê îdam kirin ku Rêxistina Parêzvana Mafê Mirovan îdama zarokên temen bin 18 saliyê mehkûm kiriye û rejîma Komara Îslamî jî li ser îdamkirina zarokan berdewam e.

Jêder: "aftabnews"



5 Milyon Kes Ji Xelkê Îranê Belengaz In

Yoneskoyê ragihand, 7 ji sedê ya xelkê Îranê bi dahateke kêmtin ji 3 Dolar di rojê de bi belengazî dijîn. Endamê bernameya avedankirina Rêxistina Neteweyên Yekbûyî di civînekê de zêdetir kir û got ku cihê nerihetiyê ye ku

welatek weke Îranê ku dewlemend e, lê xelkê wê di belengaziyê de bi jîn.

Bi vî awayî heke nifûsa Îranê 70 milyon kes be, zêdetir ji 5 milyon ji xelkê Îranê belengaz in.

Çavkanî: "irwomen"

Têmurê Xelîl Ra:

SÎYASET DI ROJNAMEVANIYÊ DA TÊ QEBÛLKIRIN, LÊ DI BERHEMÊN EDEBÎ DA NAYÊ QEBÛLIKIRIN

Hewpeyvîna: Îbrahîm Aydoğan

Dema em dibêjin edebiyata bi kurmançî, ez bi kêmanî du edebiyetan nas dikim; edebiyeta bi kurmançî ya Kurdistanê, xwesma jî ya li Kurdistanê

Bakûr, yek jî ya Soviyeta berê. Ev herdu edebiyet mixabin bêtir ku haya wan ji hev hebe, bêtir ku bandorê li ser hev bikin û hevdu dewlemend bikin, pêşda çûne û gulvedane. Tiştêkî êşkere ye, ku Kurdên Soviyeta berê, xwesma jî Kurdên Ermenîstanê, ku xwendî, zane, welatparêz û xwediyê kurmançiyê xweş û dewlemend bûn, berî 80'ê salan destpê kirin bingehê edebiyeta bi kurmançî danîn, lê nizanî çima Kurdên bakûr, ku berî çend dehsalan destpê kirin, ew bingeh ji xwe ra nekirin rênîşan. Kesên wek Kemal Burkey, Kendal Nezan, Reşo Zilan, Rohat, Nacî Kutlay, weşanên «Roja Nû» û «Nûdem»ê û hin kes û weşanên din edebiyeta Kurdên Soviyetê nas kirin û bi nivîsarên xwe va xwestin ku haya Kurdên bakûr jî ji vê edebiyetê hebe, lê ew kar wek ku dihat xwestin bi ser neket.

Eger em edebiyeta bi kurmançî himberî edebiyetên bi zimanên din bikin, em dikarin bêtir ku em ji hinekan paşda ne û li pêşiya hinekan e, lê tiştê herî bi qîmet ew e, ku bi bawerîya min di nav wan gelên cihanê da, ku teze destpê kirine bingeha edebiyata xwe daynin û pêşve bibin, Kurd him di hêla demê de, him jî di hêla kalîteyê da pêşengiyê li hemûyan dikin. Li vir em wê jî didine ber çavan, ku şert û qewilên ku edebiyata kurmançî di nav da diwîya pêş biketa û gulveda, himberî milletên din, yê herî xirab bûn. Zordestiya dijmin, qedexeya li ser zimanê Kurdî, tunebûna dibistan û Enstîtûsyonên Kurdî astengên mezin li ser rêya gulvedana edebiyeta me çê dikirin û serketina di van rewşan de yek ji destanên gelê me ye herî berbiçav e.

Niha em bîne ser bersîvên pirsan:

1. Berhemdariya Kurdî bi awayekî berdî berdane pêk tê. Em dibînin ku çî bêtir nivîsandin, di cih de çap dibe. Bê şik, di vê yekê de bandora weşangeriyê belawela jî heye. Belkî ev yek baş be ku mirov rêyê tucarî li ber çapkirina berhemeke Kurdî negire. Lê ma, gelo mirov nikare hebekî bala xwe bide berhemên ku çap dibin, da ku mirov rêya teqîneke edebî xurttir bike? Gelo tu di vî warî de çî difikirî?

1. Ez bi we ra me, ku mirov tu carî rêyê li ber çapkirina berhemeke Kurdî negire. Lê bi şertê ku ew nivîs berhema edebî be û xwediyê nivîsê jî nivîskar be. Li welatê me ev pirs bi zanebûn hatibû helkirinê. Berî ku pirtûka yekî çap bikirana, endamên komîsyona taybetî ya Yekîtiya Nivîskarên Kurdan li Ermenîstanê ew berhem dixwend, qîmetê berhemê didayê, paşê biryar dihat girtinê. Eger berhem di hêla hunerî, zimên, êstêrîkî da baş bûya, biryara çapkirina berhemê dihat dayînê û gelek caran eger ew berhema pêşin ya xwedî bûye, navê nivîskariyê yekser li xwediyê berhemê ne dikirin. Digotin va piştî çapbûna pirtûka te, ji te ra rê vedibe bona tu bibî nivîskar. Hinekan jî bi çewalan «helbest» û

"çîrok" nivîsîn, lê nebûne helbestvan û nivîskar, ji ber ku berhemên wan çap nebûn. Gelekî giring e, ku nivîskar merivêkî xwendî be. Eger wisa nebe, ewê wek wan doxtoran bin, ku doxtorî ne xwendine û emeliyeta dikin.

2. Gelo divê di warê edebî de mirov çî hêviyê ji nivîskarên Kurd bike? Di warê helwesta li hember hunerê nivîsê û ya giring jî li hember zimanê xwe û bikaranîna wî ya di edebiyatê de... li hember jiyane... li hember xwe... Gelo li gora te helwesteke nivîskariya Kurdî heye?

2. Ya giring ew e, ku berhem berhema Kurdî be, nivîskar jî nivîskarekî ku bi Kurdî bifikire û bi Kurdî binivîse be. Wê demê berhem di her alîyan da wê dagirtî be.

3. Gelek kes dibêjin "edebiyata Kurdî baş e" an "edebiyata Kurdî hê zarokeyê berşir e" an "edebiyatek bi Kurdî tune ye" an "divê ev edebiyat êdî qalîkê xwe biqetîne". Li gora te, hema bi çend hevokan, di warê roman, çîrok û helbestê de, (bi giştî edebiyat an jî yek bi yek ceşnên wê), tu di kîjan waran de pêşketinan dibînî û di kîjan waran de li ber dikevi.

3. Pêşketin di nivîsîna çîrokan da ye. Di warê roman û helbestan da pêwîstiya xurtbûn û şidandinê heye.

4. Gava ku tu edebiyata kurmançî didî ber edebiyata zimanekî din, encameke bi çî rengî jê derdikeve? Gelo, ne xeletiyek e ku di asta berhemeke edebî de mirov bi tenê rewşa zimanê Kurdî bide ber xwe û guh nede hêlên wê yê din?

4. Tenê zimanê Kurdî têr nake. Eger wisa be, em dikarin berhemên nivîskarên cihanê yê bi nav û deng bikine Kurdî û bêtir va edebiyeteke me heye. Kurdî, Kurdîti, Kurdbûn dikarin berhemeke orte jî bikine hezkiriyê her xwendevanekî.

5. Gelo tu kovar û rojnameyên Kurdî dixwîni? (Malper jî dibîn). Îroj li welêt û li Ewropayê gelek rojnameyên Kurdan hene ku hin ji wan bi Kurdî ne û hin ji wan jî nivîskardî ne. Li gora te pêdivî bi kîjan guherînan heye ku divê em di kovar û rojnameyên kurmançî de bibînin? Tu ji kovareke Kurdî an jî rojnameyê Kurdî, di warê ziman û edebiyatê de, çî hêviyê dikî?

5. Ez hemû kovar û rojnameyên baş dixwînim. Pêdivî di wê yekê da heye, ku di kovar û rojnameyan da gerekê rojnamevanî hebe. Wek ku di helbestan da gerekê poezî hebe.

6. Gelo xwendinên te yê şexsî bêtir di kîjan warî de ne (helbest, roman, çîrok, ceribandin, lêkolîn, dîrok, felsefe hwd.)? Gelo, weke nivîskarekî, tu mehê an jî salê çend pirtûkan dixwîni û bi texmînî çend ji wan bi Kurdî ne?

6. Ez piranî çîrokan, lêkolînan, nivîsên derheqa dîrokê da dixwînim. Di mehê da bi kêmî pirtûkekê dixwînim, ji wan yê Kurdî di salê da ji 3-4'an derbaz nabin.

7. Gelo tu dikarî di edebiyata Kurdî de navê du helbestvanên baş, du çîroknivîsên baş, du romannivîsên baş, du rexnegirên baş, du lêkolînerên baş, du rojnamegerên baş (dibe ku di warên nivîsandinê yê din de jî kesin ku tu dicibînî hebin) bidî me?

7. Ji ber ku min di jorê da jî got, ku ez du

edebiyetan nas dikim, lewma ezê ji Kurdistanê Bakûr û ji Soviyeta berê ji her yekê du navan bidim. Ji Kurdistanê Bakûr du helbestvanên baş Kemal Burkey û Rojen Barnas in. Ji



Soviyeta berê Fêrîkê Ûsiv û Çerkezê Reş in, du wan ra şikoyê Hesên, Qaçaxê Mirad tî. Ji çîroknivîsên bakûr Hesênê Metê û Enwer Karahan in, ji Soviyeta berê Babayê Keleş û Ehmedê Mîrazî ne. Ji romannivîsên bakûr Mehmed Uzun û Ferat Cewerî, ji Soviyeta berê Erebe şemo û Eliyê Ebdilrehman in. Ji rexnegiran diha Kemal Burkey û Rojen Barnas in, ji Soviyeta berê jî Mîkayêlê Reşîd û Keremê Reş in (Keremê Reş Sekreterê Yekîtiya Nivîskarên Rûsiyayê ye). Ji lêkolînerên bakûr di hêla edebiyetê da M. Emîn Bozarsilan, di hêla dîrokê da Malmîsanîj û di hêla zimên da Reşo Zilan, ji Soviyeta berê şekroyê Xido û Çerkez Bakayêv in (Heciye Cindî, Qanatê Kurdo, Zera Elî Yûsûpova, Emînê Evdal, Maksîmê Xemo, Îvan Farîzov, Çerkezê Reş di nav vê cêrgayê da nin). Em dikarin navê kurdzanên ne Kurd yê wek Margarîta Rûdenkoyê, Yêvgênîya Vasîlyêvayê, Mîxayîl Lazarêv û gelekê din jî li van zêde bikin. Ji rojnamevanên bakûr Rojen Barnas û Mihemed Evdila ne. (Pirtûka Rojen Barnas ya bi sernavê "Bi kurmançiya gewr" di hêla rojnamevaniyê da sertaca rojnamegeriya bi kurmançî ye). Ji Soviyeta berê Mîroyê Esed û Xelîlê Çaçan in. Van herduyan ne tenê bi dehan salan karê rojnamevaniyê kirine, lê herwiha bi dehan kadroyên rojnamevanên Kurd amade kirine. Mîroyê Esed 34 salan berpirsyarê rojnameya «Rya teze» bû, Xelîlê Çaçan jî 24 salan serokê radyoya Kurdî ya Rewanê bû.

8. Li gora te di weşanxane, rojname, kovar û malperên kurmançî de sansur (an jî qedexe) li ser hin nivîskaran heye an na? Heke hebe, li gora te, ev sansur ji ber çî ye?

8. Sansor ne lazim e, lê qedexe, diha rast kontîrol lazim e. Em ji gotina sansor aciz dibin, an jî gelekî qala demokrasiyê dikin. Carna em di karên xwe da gerekê hinekî ji van yekan dûr bikevin. Sansûr carna baş e û demokrasiyê carna xirab e. Bi saya demokrasiyê têrorist tîne ser hukûm û tunebûna sansorê jî digihîne destûrdayîna her tiştî. Gelo rojnamevanek ku di rojnameyêke organa partiyekê an jî rêxistînekê da kar dike, dikare azadiya çapemeniyê bi kar bîne û di nivîsên xwe de rexne li kar û barên siyaseta wê rojnameyê bike, an jî di wê rojnameyê de nivîsên diji wê partiyê û rêxistinê çap bike? Nikare! Ji ber ku karê wî ew e, ku siyaseta wê partiyê an rêxistinê bigihîne millet. Eger naxweze wê bike, tê wê maneyê, ku ew ne bi wan ra ne û eger ne bi wan ra be çima li wir kar dike? Nimûneyeke din bînim: eger îro bi awayekî batîni rêyek vebe, ji Kurdên bakur ra bêtir bi awayekî dêmokratî jî xwe ra serokek

BIŞAVTIN

ADAR JIYAN
adarjiyan@mynet.com

Bişavtin, şibandin û mandelekirina bi darê zorê ya kesên ku bi eslê xwe naşibine hevdu ne. Li ku û çi wextê dibe bila bibe, dirûvandin û ferikandinên ku li ser mirovan

têne ferzkirin, her gav bi qanûn û zagonên çewşîner pêk tên. Belê ev qanûn û zagonên çerwsîner jî teqez bi destê dewletê pêk tên.

Hêzên desthilatdar pêşî netewe – dewetêkê diafirînin û xwe dispêre vê netewe-dewletê û bi navê wê tevdigerin. Her ku qedexekirin, çewşandin û zordarî zêde dibe, bişavtina kêmnetewe û gelên din jî ewqas hêsantir û lezgintir dibe.

Dewlet bi xwe, ew erk û hêza serdest a ku bi civaka çindar re derketiye holê ye. Û ew, her gav çîna serdest û desthilatdar temsîl dike. Çîna desthilatdar her kesî û her tiştî di bin siwana xwe de dicivîne û bi rê ve dibe. Nahêle tu kes li gorî daxwaz û vîna xwe tevbigere. Her mirov jî hêla dewletê ve wekî alaveke hilberiyê tê dîtin û qebûlîkirin. Pergala dewletê her gav li ser vê feraset û mantalîteyê ava dibe. Sazî û meşrûngiyên rêveberiyê bi vê mebest û armancê têne damezrandin. Ji bo wê, di xweza û reseniya dewletê de mirov û mirovatî nîn e. Wekhevî û yeksanî nîn e. Aştî û azadî nîn e. Şahî û dîlşahî nîn e. Aramî û giramî nîn e. Hezîkirin û rêzdarî nîn e. Maf û hiqûq nîn e. Şardekirin û şarezahî nîn e... Belê berevajî wê çi heye? Serdestî û bindestî heye. Fermandarî û fermanberî heye. Axaî û xulamî heye. Xwedatî û benîî heye. Şer û kuştin. Dagirkirin û talan heye. Bişavtin û mandelekirin heye. Girtin û darizandin heye...

Polîtîkaya dewletê a herî dijwar û bandordar bişavtin e. Di kevnepiya dewletan de civakên pirzimanî, pireçandî, pirolî, piredengî û pîrerengî nîn in. Civakên yekzimanî, yekçandî, yekolî, yekdengî û yekrengî hene. Dewlet, li gorî berjewendiyên xwe ziman, çand û olekê diafirîne. Ziman, çand û ola ku diafirîne, li ser takêkê û civakê dide ferzandin.

Xunaftin, dehandin, gewirandin û xwemalîkirina mirov û civakê bêtir bi riya bişavtinê pêk tê. Her mirov jî hêla dewletê ve bi vê mebestê tê xwedîkirin, gihandin û perwerdekirin. Şens û siûda tu kesî nîn e ku xwe ji ber bayê bişavtinê bide alî. Belê wekî her tiştî, dûgel(dewlet) jî bê hemdê xwe dijmin û dijberê xwe bi xwe re diafirîne. Û ev dijmin û dijber jî hizra mirovatiyê ya yeksanî, azadî, aştî û aramiyê ye. Îcar dewlet, her gav pest û kotekên xwe yên tund û dijwar û bêdeman li ser kesên ku vê hizr û ramanê diparêzin, dikudîne. Ji bo wê, mafê girtin, kuştin û

darizandinê di xwe de dibîne; ango qanûn û zagonên bişavtinê bi kar tîne.

Bilokên şer(civata

dewletan ku ji bo berjewendiyên xwe hatine cem hev), ên ku bi hinceta dagirkirin û desthiladariyê tevdigerin hemû serî li polîtîkayên bişavtinê didin. Û pêşî dest davêjin zimanê gel û civakê. Peyre jî çanda gel û civakê qedexe dikin. Çimkî mehandin, helandin û tunekirina çandê her gav bi qedexekirina zîmên dest pê dike. Di serî de zimanê gel û civakê niştecîh tune dihesibînin û zîmanekî çêkîrî û demdemî yê fermî diafirînin. Vî zîmanê fermî, derî daxwaza gel û civakê li hemû qadên jîyanê didin bikaranîn û rûnandin.

Tehrîbat û rûxandinên ku di hişmendiya civakên bindest de pêk tên, ji gelek şer û pevgûnên erjeng û kujîner dijwrtir in. Bişavtin û tunehesibandin her gav bi dewletbûnê dest pê dike. Ji dûgela sumerîyan bigirin heta komarên îroyîn yên hemdem, hemû dewlet, bişavtina civakê wekî mortal û alaveke xweparastinê bi kar anîne. Ango, cihê ku tiliya dewletê tê de hebe, ne pêkan e ku gel û civakê cihêreng iflehî xwe bibin û bi bayê bişavtinê nekevin.

Der barê dewletê de hin fikr û nêzîkahîtdanên weşbîn (belê heta bêbes kawîk û xeşim) hene. Hin dewletan wekî “dewletên otokratîk” dewletên teokratîk”, “dewletên demokratîk”, “dewletên sosyalîst”, “dewletên faşîst” û hwd. disenîfin. Belê nîzanin ku hemû dewlet him desthilatdar, him otokratîk, him teokratîk û him faşîst in. Û dîsa nîzanin ku ne demokratîkbûn, komînîstbûn û sosyalîstbûna tu dewletan ne pêkan e. Ji lewre sosyalîstî, komînîstî û demokratîkbûn bi xwe civakîbûn e. Ango sivilîzasyon e. Û sivilîzasyon jî şarezabûn bi xwe ye. Hêşku dewlet durr civakîbûn û şarezabûnê ye. Ji bo wê ne pêkan e ku dewlet şareza û medenî bibe. Belê şarezabûn, civakîbûn û komelayîbûna her civakê her gav pêkan e. Bi kurtayî dewlet, bişavtin bixwe ye. Û bişavtin her dem bi destê dewletê pêk tê. Yên ku pişta xwe bi dewletê girê bidin, dê tu carî nikarin xwe ji bişavtin, mandelekirin û darizandinên dewletê rizgar bikin.

Dermanê bişavtinê lixwexwedîderketin e. Lixwexwedîderketin, bi nîrxdayîna ziman, çand û kelepûra netewe-civakîbûnê bi dest dikeve. Dijminê netewe-civakîbûnê, netewe-dewletbûn e. Îro tê zanîn ku gel, civak, netewe û kêmneteweyên dinê hemû di bin gefxuriya netewe-dewletan de dieçiqin û tîk dieçin. Carekê, pergala dewletbûnê tu car nahêlin ku civakîbûn û demokratîkbûn pêk were. Yanî damezradin û avakirina dewletê ne çareserî ye. Çareserî demokratîkbûna civakê ye.



hilbijêrin. Ma wê ne ew kes bê hilbijartinê, ku namzadê pêxemberiyê bû, lê dawî derket ku kî ye. An jî hinek kes, piranî Kurdên ji Soviyeta berê, niha di nivîsên xwe da dinivîsin, ku Soviyet welatekî dîktator bû. Îcar di dema dîktatoriye da di hêla edebiyatê, zanariyê, çand û hunerê da rengîniya me bû, lê dema dîmokratîyê jî em ketine deriyan. Li wî welatê «dîktatoriye» çend kesên zane, welatparêz û aqil berhev dibûn û li ser pîrsekê biryarek derdixistin, ji ber ku zanibûn eger bi awayekî demokrasî biryarê bidine destê mîlet, ewê biryareke xelet, hela di ser da jî biryareke ji bo mîlet ziyankar û zirardar bide.

9. Gelo, li gora te, rola weşangerên Kurd di vê rewşa edebiyata kurmançiyê de (baş an jî nebaş) heye? Gelo tu çi hêviyê ji weşanxaneyê Kurd dikî?

9. Eger weşanxaneyek pirtûkeke xirab derdixe, navê wê weşanxaneyê di nav mîlet da dikeve. Îcar ew nikare xwe bi wê yekê va efû bike, ku pirtûk ya filankesî ye û eleqê wê pê tune. Belê pirtûk ya filankesî ye, ango ewî filankesî berhemên xwe mor kirine, lê di pirtûkê da mora weşanxaneyê jî heye, ango weşanxane qîmet daye wan nivîsên ku nivîskar navê berheman lê kiriye. Belkî çapa wê pirtûkê ji weşanxaneyê ra pereyekî baş tîne, lê navê weşanxaneyê gerekê ji pereyan buhatir be.

10. Li gora te, gelo siyaseta bi rastî jî diwaran di navbera nivîskaran de ava dike an na?

10. Siyaset di rojnamevaniyê da tê qebûlîkirin, lê di berhemên edebî da nayê qebûlîkirin.

11. Êdî şaredariyên gelek bajarên Kurdan di destên Kurdan de ne û çalakîyên çandî û edebî bi piştgiyariya van şaredariyan ve tên kirin. Mihriçanên çandî jî yek ji wan çalakiyan e. Gelo biserketin û kêmaniyên van mihriçanên Kurdan li gora te çi ne? Di kîjan waran de divê mirov amadekarên mihriçanan pîroz bike û divê mirov di kîjan waran de gazindan ji wan bike?

11. Ez ser vê meseleyê tişteki zêde nikarim bêjim, tenê zanim, ku ji Kurdên Soviyeta berê di wan mihriçanan da an kesên piştgiyê apociyan, an jî kesên ji edebiyatê û çandeyê gelekî durr têne vexwendinê.

12. Tişteki din ku tu bixwazî lê zêde bikî?

12. Di nav her miletekî da qîmetê berhemêke edebî mîlet dide. Eger berhem baş be, pirtûk baş tê firotin, xwendevanên wê her diçin pirtir dibin. Îcar di nav Kurdan da ne wisan e. Berhem baş be jî, ne baş be jî, nayê firotin. Hêla di ser da berhemên sist zêde tîne firotin, ji ber ku mîlet ji wan berheman fêr dike, lê ji yên dagirtî fêr nake. Firotin gelek caran bi ektîviya nivîskar va, lê ne bi kalîteya berhemê va girêdaye. Nimûneyeke vê yekê ew e, ku weşanxaneyê Kurdan berî du-sê salan romana Kurdî ya duduyan ya Elîyê Ebdîlrehman bi sernavê «Xatê Xanim» çap kir, lê heta niha çend deh heb hatîye firotin. Berhem jî baş e, nivîskar jî yekî navdar e. Kurdîya wê jî gelekî baş e, lê Niha roja me ev di û em di vî halî da ne!

Çeprast:

1. Gêj – Şahê dengbêjan.
2. Dema noka têne kutan, ev tişt li ber dimîne – Ne.
3. Berevajî navê heywanekê ye – Navê rûbarekê ye – Kanê?
4. Reh û rîşeya lîstin – Xûşk – Heke ev peyva bê ducarîkirin, tê wateya Zarokên sava.
5. Berevajî navê îmîşkê ye – Ew ciyê ku di zivistana de pez dibine wir û giya didinê.
6. Di Farsî de tê wateya Xwedê – Bavê Qazî Mihemed bi destê wan hate kuştin.
7. Heke **N** bihê zêdekirin, navê kovareke Kurdî ye – Meh.
8. Heke ev peyva bihê ducarîkirin, di Soranî de tê wateya şîn û tazî – Bidarvekirin – Di bîrkariyê de heye.
9. Navê hevînameyekê ye – Ragehandin.
10. Navê straneke Kurmancî ye, ku hunermend Deniz Demanê jî ew sitiran gotiye – Berevajî heke **N** bihê zêdekirin, navê helbestvaneke Fars e.

Serjêr:

1. Navê welateke Afrîqayê ye – Qewmê Tirk ji derdora wê golê ve ber bi aliyê Îranê hatine.
2. Xelkê Mokiryanê ye û ferhengokek jî nivîsandî ye – Navekî Kurdî ye.
3. Yek – Naznavê Zêndan – Di Îngilîzî de tê wateya **An, Yan**.
4. Ji zeytûnê jî tê girtin – Ciyekî girîng jî laşê mirov pêk tîne.
5. Zîrek – Navê lîstikvaneke Ewropî ye ku filmên pirr xweş dilîze.
6. Dema giya didirûn û li ser yek datînin dibêjnê... – Navê helbestvaneke Kurd e.
7. Pişt çemiyayî – Di Farsî de tê wateya Dayîk.
8. Kurtkiriya Komîsyona Azerbaycan û Kurdistan – Qebra wî pêxemberî dibêjin di Başûrê Kurdistanê de ye – Nik.
9. Navê mehekê ye di Erebî de – Berevajî tê wateya pîs.
10. Di Îngilîzî de tê wateya Belê – Di Erebî de tê wateya Bira – Îrade.

Bersiva Xaçepirsa Hejmara 44'an

	1	2	3	4	5	6	7	8	9	10
1	Ê	Û ₁	E	S			H	A	W	I
2	T	O	R	A			H	A	Û ₂	Î
3	A	L	A	X			C	A	R	Î
4	N	O	K		T	I		L	O	R
5	O	N		F	A	R	K		N	E
6	L		K	E	W	S	E	R		H
7		C	E	R			D	Ê	N	
8	G		Û ₃		M	E		B		S
9	Ê	V	A		A	D		A	C	Û ₄
10	L		C	A	R	L	Î	Û ₅		W

Peyva veşartî ○ ○ ○ ○ ○
1 2 3 4 5

Bersiva Sudoku a Hejmara 44'an

6	8	5	4	2	7	1	9	3
9	1	3	5	8	6	2	7	4
2	7	4	1	9	3	8	6	5
1	6	2	8	7	5	4	3	9
5	9	8	3	1	4	7	2	6
3	4	7	9	6	2	5	1	8
4	2	6	7	5	9	3	8	1
7	3	1	6	4	8	9	5	2
8	5	9	2	3	1	6	4	7

Xaçepirs

Amadekar: Şehab Xalidî

	1	2	3	4	5	6	7	8	9	10
1			Û ₂							
2								Û ₄		
3										
4										
5										
6										
7								Û ₁		
8								Û ₃		
9										
10										

Peyva veşartî ○ ○ ○ ○ ○
1 2 3 4

Xaçepirsa Hejmaran (Sudoku)

	8					3		7
7	3	1				5	8	6
	9	2	7	8		4	5	
		8	4		7			9
		4		1				5
	1		5		6	7		4
8	4	9			2			3
	5	6					2	
1	2		3	9	8	5		6

Ji bo bersîvdana Xaçepirsa hejmaran (Sudoku)yê ya nû, tenê van sê xalên jêrîn berçav bigirin:

1. Hejmarên 1-9'ê di xet(xêz) û stûna serjêr de tenê carekê dubare dibe.
2. Hejmarên 1-9'ê di xet(xêz) û stûna çeprast de tenê carekê dubare dibe.
3. Hejmarên 1-9'ê di nava çargoşeye 3×3 de tenê carekê dubare dibe.

Nûnerê Amerîka Li Îraqê:

Îran Li Rêya Hin Girûpên Çekdar Yên Şîi Ve Haya Tund û Tûjî Di Îraqê De Dide

Zelmay Xelîlîzad, Balyozê Dewletên Yekbûyî yê Amerîkayê li Îraqê di hevpeyînekê de bo

rojnameya "The New York Times" a Amerîkî, da zanîn ku dewleta Îranê ji rêya hin girûpên çekdar yê Şîi ve haya alozî û têkdana tenahiye di Îraqê de dide û vê yekê weke tolhildan li hember êrîşên Îsrailê bo ser Hizbelahê encam dide.

Xelîlîzad da eyanê ku Îran haya tund û tûjiyê li dijî hêzên Amerîka li Îraqê de dide û ev haydanên Îranê bûne sedema wê ku êrîşên wan girûpane bi rakêt li ser devera Kesk a Bexdayê pêtir bin. Herweha îşare bi êrîşên rokêtî yê



"Mortier" kir ku ji aliyê girûpeke veqetiyayî ji "Sipaha Mehdi" a ser bi Muqteda Sedr hatine encam dayîn û vê girûpê ji pêwendî bi Îranê ve heye.

Îran û Turkiye Sinûrên Herêma Kurdistanê Bombebaran Dikin



Topavêjên her du welatên Turkiye û Îranê bi tundî de vera Xînêre, Lolan, Xwakurk, Corcan, Qebrê Zahir û Nazdarî Dax bombaran kirin.

Hêjayî gotinê ye ku di encama vê êrîşê de hevwelatiyek şehîd û yekî din jî birîndar bûye ku ser bi eşîreta Herkî di vê deverê de ne. Xelkê wan deveran neçar bûne ku mal û halên xwe bi cih bihêlin û rû ji ciyên bilind û çiyayî bikin.

Her di vê çarçoveyê de çend rojan berî niha serokê demî yê YE û Wezîrê Derve yê Finlandayê di seredena xwe ya ji bo Turkiyê û di bersiva pirsên rojnameya "Milliyet"ê de ragihand ku Operasyona ku Turkiye dixwaze li hember PKK'ê li derveyî sînor de encam bide, dê bibe problem. Wekî operasyonên ku Îsrail di Libnanê de dike, tu çareseriyê naîne û dê zêdetir pirsgrêkan derxîne holê.

1350 Kesan Li Silêmaniyê De Xwe Şewitandine

Li gor malpera Pukmedia di serhejmariyekê de ku di nexweşxaneyê

"Îmêrcînsî" ya Silêmaniyê de hatiye encamdan, di sala 2005'an hetanî 2006/05 ê de, 1350 kes xwe şewitandine.

Di sala 2005'an de, 1248 kes xwe şewitandine ku 714 kes ji wan jin û 570 ji wan jî mên in, 208 kes ji wan jî bi sedema xurtbûna şewitînê jiyana xwe ji dest dane ku 153 kes ji wan goriyan jin û 55 kes ji wan jî mên in. Her wiha di 4 mehên destpêka sala 2006'an de, 66 kes jiyana xwe bi vê sedemê ji dest dane ku 51 kes jin û 15 kes jî mên in.



Hêjayî gotinê ye ku sedemên vê diyardeya zeq û berbiçav di Kurdistanê de zêdetir vedigere ser pirsgrêkên civakî û roj li pey rojê xurttir dibe û heya niha jî tu cehd û tekoşînek ji bo vekolîn û çareserkirina wê nehatiye dayîn.

